

BI ZANÎYARÊ MEZIN R'A

(Bîranîn ên di derbarê wêjezan ê k'urd ê navdar, professor Ordîxan ê Celîl da)

Cotmeha îsal (2024) dibe 17 sal, ku zanîyar-wêjezanê k'eddar, zargotinzan Ordîxan ê Celîl ne bi me r'a ye.

Huvdeh sal- jîyanek a t'am!

Lê ew îro jî di bîranînên gelê xwe, k'arheval û birayên xwe yê pênûsê da dijî, îro jî ew bi berhemên xwe yê giranbiha yê zanistî va, bi nîgara xwe ya geş va beşdarî jiyana gelê xwe ya çandî dibe...

Bi r'astî, dema pêkanîna k'arê xwe yê p'îşeyî ez bi xwe bi gelek nûnerên r'ewşenbîrîya k'urd ên serdema sovêtî r'a nas bûme, bi hinekan r'a p'ewendîyên me yê hev'arîyê û dostanîyê hebûne, lê belê, nasîya min bi Ordîxan ê Celîl r'a p'ir dereng pêk hat.

Dema ez xwendk'arê zanîngeha Yrêvanê bûm, ew p'eywirdarê zanistî yê Şaxê Lênîngradê yê Înstîtûta r'ojhilatzanîyê ya Akadêmîa Zanistî ya Yekîtiya Sovêtê bû, û di cîhana zanistê da êdî wek pisporekî çê dihat zanîn. Wê demê êdî p'irtûkên wî yê "Poêziya Cegerxwîne bajarvanîyê" (s. 1966) û "Destaneya gelê kurd a gelêrî ya "Xanê çengzêrîn" ("Dim-Dim")" (s. 1967) hatibûn weşandin.

Di p'irtûka wî ya di derbarê jîyana Cegerxwîne Mezin û helbestvanîya wî da ji bilî nirxandineke zanistî ya berfireh wisa jî berhemên demên cuda yê Dengbêjê Azadîyê, yê di derbarê evîna welêt û welatp'arîzîyê da bi tîpên kîrîlî (r'ûsî) hebûn.

P'irtûkê di nava ciwanên k'urd ên Yekîtiya Sovêtê da bi xurtî deng veda...

Û wekî dinê nikaribû jî bibûya. Ma ne Cegerxwîne Mezin damezirînerê poêziya k'urdî ya welatparêzîyê ya sedsala XX dihat zanîn. Ewî berhemên xwe dîyarî gel û welatê xwe kirine, û bûye dengbêjê têk'oşîna r'izgarîxwaz a ji bo azadîyê. Û lewra jî berhemên wî di welatê wî yê mêtîngeha dagerkeran da qedexe bûne. Lê salên 60-î yê sedsala XX p'irtûka navborî ya mamosta Ordîxan ê Celîl, ê ku wê demê hê zanîyarekî ciwan bû, di jîyana k'urdên Yekîtiya Sovêtê da dewrek (r'ol) a bêhemp'a dilîze: nivşên dihatûyê bi helbestên Dengbêjê Azadîyê bi r'uhê welatp'arîzîyê p'erwerde dibin...

Dema zanîyar ê navdar dem bi dem dihat Yrêvanê - sêtiya dê û bavê xwe bike, û wisa dibû, ku em r'astî hev dihatin, me hev slav dikir, ewî t'ime pîrsa pêşk'evtinên me di warê zanistê û afrandarîyê da dikir û bi xêrxwazî digot, ku ew amade ye, bi şewrên xwe destekê bide me, eger di hinek pîrsan da pêdivîya alîk'arîya wî derê ...



Dema komcivîna zanistî ya navnetewî ya zimanê kurdî Ji çepê: Ezîz ê Cewo, Ordîxan ê Celîl û Celîl ê Celîl. Amed, 04. 12. 2004.

Hê dereng, dema min di Yêrêvanê da êdîtorîya r'ojsnameya "Botan", lê paşê di Moskovayê da ya "Axîna Welat" pêk tanî, bi boneyên cuda çend caran hevdiîtinên me yê kar pêk hatine... Ne zêde!

Lê paşê bûyerek pêk hat, a ku bi bîngêhîn dîtinên min ên di derbarê wî mirovê xwedîyê dil û gîyana mezin, zanîyarê navdar û welatp'arîzê r'astîna da guhartin.

Bi vexwendîna şaredarîya Ameda p'aytexta K'urdistanê k'omek k'urdzanên Rûsîyê diçû beşdarî bizav û çalakîyên "R'ojên wêje û zimanê k'urdî" bibin (4-7-ê berfanbara s. 2004-an). Ev şanda ji van kesan pêk dihat: wêjezan Ordîxanê Celîl,

zimanzan Îraîda Smîrnova, Zara Yûsûpova (hersêk jî ji Sankt-Pêtêrbûrgê) û xudanê van r'êzan – ji Moskovayê.

Êdî di balafir'geha Amedê da nûnerê komîtêya amadek'ar a bizavê em agahdar kirin, ku zanîyarê k'urd ê Sovêtê yê navdar Celîl ê Celîl êdî gihûtye cî. Ew ji Vîenna ya p'ayt'exta Awstrîyayê hatibû.

Ji bo beşdarbûna vê çalakî-bizava bêhemp'a ji çarhêlên cîhanê zimanzan, wêjezan, nûnerên çand û hunerê û r'oynameger hatibûn p'ayt'exta K'urdistanê...

Wan r'ojan, tuyê bibêjî, Amed bibû navenda cîhanê. Ji welatên cuda ji bilî nûnerên r'ewşenbîrîya k'urdî wisa jî *alman, rûs, amêrikî, holandî, ermenî, svêdî, tirk, kanadî* û gelekên dinê hatibûn...

Û li vira, di goveka "R'ojên wêje û zimanê k'urdî" da em beşdarî bizav û çalakîyên cuda bûn, di nava wan da wisa jî beşdarî k'arên k'omcivîna zanistî ya navnetewî ya zimanê k'urdî û sîmpozîûmên cuda bûn. Em wisa jî bi r'êzdarî beşdarî hevdtinên ast û naver'okên cuda û şevên poêziyê bûn, û wana bandoreke p'ir' mezin li ser me hîştin.

Ew r'ojana bi bizav û çalakîyên cihêreng va wisa dagirtî bûn, ku me pêr'a jî negîhand, hîs bikin, k'a dema me çawa derbaz bû. Ew bi r'astî bûyereke bêhamp'e ya nebînayê bû. Hê dereng, dema me bizav û çalakîyên wan r'ojan û hevdtinên xwe bi nûnerên r'ewşenbîrîya welêt û yên bîyanî r'a jinûva wat'edar kirin, em tê gihîştin, ku ew hemû ne ku t'enê ji bo navnet'ewîkirina lêger'înên zanistî yên wêje û zimanê k'urdî xwedî giringîyeke mezin bûn, lê wisa jî ji bo me – her beşdarekî wan R'ojan: wê demê ew hewa, ya ku di Amedê da desthilatdar bû, alîk'arî da me, ku em xwe û hev bêhtir baş nas bikin û di navbera me da nêzîkayîk a r'uhî-r'ewanî pêk bê...

Wan r'ojan, qey bibêjî, em k'etibûn cîhatek a dinê – ya ji bo me ewqas dûr û nenas, lê di heman demê da, ewqasî jî nêzîk û nas. Û ev cîhana bi hemêza vedikirî me pêşbazî dike – wek dayîka zar'okên xwe yên ji xerîbîyê vege'rayî.



Li bal şaredar ê Maedê Osman Baydemîr. Ji çepê: bi xwe – şaredar, Celîl ê Celîl, Ordîxan ê Celîl, Ezîz ê Cewo, Mazhar Zûmrût... Amed, 04. 12. 2004.

Û di nava min da hestên nenas serî hildidin, û ez dixwazim tê bigihîjim, k'a, gelo, ew çi ye, ya ku li dora me û bi me r'a pêk tê: "Ya Xwedê, em di heman Ermenîstana Sovêtî da hatine cîhanê, me heman zanîngehê da xwendye, bi heman şaxê zanistê va mijûl bûne, gelek nirx hebûne, yên ku em nêzîkî hev kirine, li vir û wir em r'astî hev hatine, car-carana me li ser pirsên cuda, yên ku bala me k'îşandine, govtûgo

kirye, lê hîç tiştekî jî em ewqas nêzîkî hev nekirine, çiqasî vê r'ewîfîya me ya welatê kal û bavên ê dîrokî!"...

... Û, weha, piştî bîst salî ez dîsa li ber t'extê nivîsarê r'ûniştîme û dîsa yek bi yek li wan fotowênayan dinihêr'im, ên ku me wan r'ojan li Amedê bi hev r'a k'îşandine. Û ez bi mitaleyan jinûva vediger'im Kelah a Navendî (akropolîs) ya kevnar a welatê me, jinûva bi zanîyarê mezin r'a dik'evim nava galegalan û hewl didim, her gotineke wî jinûva wat'edar bikim...

Tê bîra min, dema em piştî r'ûniştina yekem a k'omcivîna navnete'wî ya zanistî ya zimanê k'urdî diçûne navberê, ew berbi min vege'raya û got: "Binihêr'e, bi r'astî, ji bo ku em

dewleta xwe avabikin, hemû merc p'eyda bûne. Û çito kadro gihîştine – her yek ji wana dikare r'êvebirîya bajarekî, lo çima jî – na, welatekî bike! Belê, – ew demekê k'ete nava mitaleyan û paşê domand, – Ez berê jî hatibûm Welêt, lê îro lap cuda ye, mirov bawer jî nake... Îro her t'enê Yekîtiya Net'ewî me pêwîst e... Her Yekîtiya Net'ewî dikare bibe ewlehî û misogerîya serxwebûna me – wek net'ew!...”



Li p'er'ên Amedê. Ji ç'epê: Ezîz ê Cewo, Ordîxan ê Celîl û Mazhar Zûmrût. 07. 12. 2004.

Min dizanibû, ku mamosta Ordîxan ê Celîl salên 90-î yên sedsala XX bi nivîsk'ar û r'ojnagerê navdar, nemir Mûsa Ant'er r'a t'evayî li Stembolê beşdarî vekirina Înstîtûta k'urdî bibû, ku di K'urdistanê da gelek nas û dost û hevalên wî yê dilsoz hebûne, ku ewî, bila ji dûrva be jî, bi baldaryeke mezin bûyerên Welêt şopandine.

Her agahîyek a erênî û qenc t'evahîya r'uh û r'ewanê wî welatp'arêzê xwedî dilê mezin bi hestên şabûnê

tujekirinr.

Gelek caran, dema professor di cîhana lêger'inên xwe yên zanistî da wisa xwe ji bîr fikir, qey bibêjî ewî li der-dorên xwe hîç tiştek nedidît. Tê bîra min. catrekê li Moskovayê, dema ew hatibû mêvandarîya me, min dil da xwe, di wê derbarê da jê bipirsim. Zanîyarê mezin guh da pirsra min û bi k'en bersivand: “R'ast e, dibe, ku ez li dora xwe tiştekî nabînim, hîç tiştek jî bala min nak'işîne, heya dibe, ku ez di derbarê hebûna xwe bi xwe da jî ji bîr dikim, ji bilî K'urdistanê, lewra ku ev hemû, çi ku ez dinivîsim, dîyarî wê ye, ji bo wê tê afrandin”.

Û bûyereka balk'êş jî, ya ku jipêşva şeweyê têk'ilîyên me yên pêşr'oje dyar kirin: piştî “R'ojên wêje û zimanê k'urdî” em di bin bandora wan bûyerên dîrokî û bi r'aman û mtaleyên ciyawaz vediger'yan male.

Balafir'a me li balafir'geha Stembolê danî û fir'îna xwe ya berbi Moskovayê va dê her piştî 5-6 katan destpê bikira. Me bir'yar kir, ji balafir'gehê derên, hinekî bigerin, bi hev r'a qahweyekê vexwin û di derbarê wan r'ojan da dîtînen xwe p'ev biguhêr'in...

Dema di nava gotûbêjê da gotin hat ser gotara min, Zara Yûsûpovayê (Zera Elî – doktora filolojîyê) got ku mijar li wê balk'êş hatye xuyan, ku ewê binenimûneya (orîjînal) gotarê li ber ç'avan r'a derbaz kirye, û, wek ku tê xuyan, ew bêhtir k'ûr û berfireh e, ne ku destpêkê tê xuyan... Ew demekê k'ete nava mitaleyan, piştra berbi min vegerya:

– Te nedixwast li bal me (Mabesta wê Şaxê Sankt-Pêtêrbûrgê yê Înstîtûta R'ojhilatzanîyê ya Akadêmîa Zanistî ya Fêdêratsîona R'ûsîyayê bû) di aspirantûrayê (*graduate school*) da bixwînî?

Min nîv laqirdî-nîv ciddî bersîv da.

– Hûn kêmî-kên 20 salî derengî mane.

– Çi?... Çima?... – Ewê bi şeweyek matmayî pirsî.

– Lewra ku min mînimûm (ezmûn) xwe êdî ji zûva dane, û p'irtûka min jî êdî ji bo weşanê amade ye. Fermo, eger ew bi r'astî ji bo we balk'êş e, hûn dikarin ewê bi carekê r'a daynin nirxandinê...

Zera Elî berbi Îraîda Smîrnovayê (doktora filolojîyê) va vege'ya, demekê bêdeng ma, piştr'a bi kurtî bir'î:

– Bi gotinekê, r'ewîtîyek a balk'êş bû, mirov çi dikare bibêje!?!...

Paşê k'oma me vege'ya Moskovayê, piştî r'ojekê me mêvanên xwe ver'êyî Sankt-Pêtêrbûrgê kirin.

Piştî mehekê li Moskovayê, di r'ojnameya «Свободный Курдистан» // “K'urdistana Azad” da bi zimanê r'ûsî gotara min a “Hemû r'ê dibin Amedê” r'onahî dît (Korda Mad (Aziz D. Mamoyan), «Все дороги ведут в Амад» – газета «Свободный Курдистан», 2005 г., № 1/32. Kurdîya gotarê li vir e: https://www.amidakurd.net/ku/tekst/wê_demê_amedê_ji_me_r_a_çi_got). Di gotarê da di derbarê r'êwîtiya me, çalakîyên zanistî û çandî yên wan r'ojan ên bi naver'oka xwe va t'êr û t'uje û di derbarê hest û hîsên me yên r'ewanî da dihat vegotin.

Ew gotar k'arhevalên me yên Sankt-Pêtêrbûrgê jî xwendibûn...

Demek jî dibihure, û professor Ordîxanê Celîl bi xwe t'êlêfon dike. Piştî hevslavkirinê û pirs û pirsyarên kurt, ew dibêje, ku gotar li wî û k'arhevalên wî xweş hatye... Dîsa hinek pirs..., û, tuyê bibêjî, hema wisa, di nava gotinan r'a, dipirse:

– ... Erê, min çî dixwast bipirsya, govtûgoya te û Zera Elî ya li Stembolê tê bîra te? Te wê demê di derbarê p'irtûka xwe da got. Ew di çî r'ewşê da ye, heya çî astê amade ye, eger, em bibêjin, hinek pispor bixwazin wê bixwînin û nêr'îna xwe bibêjin?!

Min got, ku ew amade ye, ku li Moskovayê êdî zimanzanekî ew xwendye. Paşê min pirsî, k'a, gelo, pirs di çî da ye? Ewî got, piştî vege'ya ji Amedê ewana di derbarê beşdarbûna xwe ya çalakîyên çandî-zanistî da sazîyên xwe yên zanistî (akadîmîa) û p'erwerdeyî (zanîngeh) bi hûrbînî agahdar kirine. Lê paşê, dema hejmara r'ojnameyê ya bi gotara navborî gihîştîye ber destê wan, govtûgoya me ya li Stembolê hatye bîra wî, û ewî di wê derbarê da ji k'arhevalên xwe r'a vegotye. Pirsê bala wan k'işandye, û wana daxwez kirine, bi wê berhemê r'a nas bibin...

Pêwîst bû, ku anegorî pîvanên k'arên wisa şewazekî bidin binenimûneya destnivîsara (têksta orîjînal) p'irtûkê û wê bigihînin Sankt-Pêtêrbûrgê. Hema ew jî min pêk anî.

Weha, dema binenimûneya destnivîsara p'irtûkê êdî li Sankt-Pêtêrbûrgê bû, ez vege'yam ser k'arên xwe yên r'ojane, û derdorê 5-6 mehan bêdengîyek desthilatdar bû..., heya r'ojekê professor t'êlêfon kir û em agahdar kirin, ku Şewra êdîtorîyê-weşanê ya fakûltêta r'ojhilatê ya Zanîngeha dewletê ya Sankt-Pêtêrbûrgê bir'yar girtye – p'irtûkê biweşîne.

Û, weha, sala 2007-an p'irtûka xudanê van r'êzan a “T'aybetmendîyên r'êzimanî yên navdêr û bingehên destpêkî yên mak-zimanê hindewropî di k'urdî da” (A. D. Mamoyan: «Грамматические категории существительного и основы индоевропейского праязыка в курдском». С.-Петербург – 2007 г.) hate weşandin.

Nêr'îndarên (reviewer) zanistî yên weşana p'irtûkê zanîyarên R'ûsîyayê yên navdar: wêjezan-zargotinzan, professor Ordîxan ê Celîl û zimanzan, akadêmîsîan ê Akadêmîa Zanistî ya Fêdêratsîona R'ûsîyayê, wergêr û r'avek'arê zanistî yê “Avêsta”-yê Îvan Mîxayloviç Stêblîn-Kamênskîy bûn.

Ji bilî nêr'îndarîyê ewana wisa jî bi şewir û bîr û boçûnên xwe ji k'arê amadekirina binenimûneya destnivîsara p'irtûkê yê destpêkî r'a bûne alîk'ar.

Her çendî profîsor Ordîxan ê Celîl wêjezan-zargotinzan bû, lê di nava goveka baldarîyên wî yên zanistî da zimanzanî jî cîyê xwe yê cuda hebû ...

Carekê, dema destnivîsarên p'irtûkê bi serer'astkirinên dawîyê va êdî amade bûn, û em r'astî hev hatin, ku wan û binenimûneyê hemberî hev bikin, professor bi şeweyekî ciddî got: “Bi nêr'îna min, dîtina te ya di derbarê alfabêya k'urdî da di çî da ye û r'ast e. Dizanî, min li ser wê pirsê hê sala 1966-an di p'irtûka xwe ya di derbarê poêzîya Cegerxwîne Mezin da nivîsye”.

Û, bi r'astî jî, dema min p'irtûka mamosta ya navborî jinûva xwend, gotinên wî yên di derbarê alfabêya k'urdî da dîtin (r'û. 16), paşê di wê derbarê da di gotara xwe ya “... Dîsa li ser pirsê alfabê” da bîr anî (<http://www.pen-kurd.org/kurdi/ezize-cawo/disa-liser-pirs-alfabe.html>; https://www.academia.edu/117720927/%20Dîsa_Li_Ser_Pirs_Alfabê):

Di derbarê jîyana zanîyarê navdar, k'arên wî di warê zanistê û wêjeyê da mirovê bikaribe bi cildeyan lêger'înen zanistî binivîse, û ez bi bawerî im, wê demê bê, ku xwendk'ar

û mamostayên zanîngehan dê di warê berhemên wî da lêger'înan pêk bînin, dê ji mîrasa wî ya zanistî û wêjeyî dersan derxin. Jixwe, jîyana wî mînakek e, k'a divê mirov çawa xizmeta gelê xwe û nirxên wî yên r'ewanî û r'amanî bike, k'a di praktîkê da mirov çawa dikare destekê bide k'arê pêşveçûna wêje, huner û çanda net'ewî.

Bi van mitaleyên ez careke dinê notên xwe yên wan r'ojên dîrokî û nivîsên demên cuda weşyayî li ber ç'avan r'a derbaz dikim, di mitaleyên xwe da bi wî mirovê mezin, zanîyar û mamostayê navdar r'a dik'evim nava galegalan û bi dilêşî kêmasîya wî Mirovê Mezin bi hemû r'ewan û r'amana xwe va bi k'ûrahî hîs dikim: bi bihuşîbûna wî gelê k'urd û k'urdzanîya cîhanê nirxekî mezin winda kirin...

Ewî pê'r'a gîhand, gelek nirxên çanda net'ewî ji windabûnê r'izgar bike û bike hebûna t'evahîya mirovahîyê, lêbelê, sed heyf, beşekî mîrasa wî ya zanistî hê di r'ewşa destnivîsarî da di arşivên wî da dimîne û hîvîya weşandina xwe ye.

Berhemên wî yên "Xanê ç'engzêrîn" ("Dimdim"), "Stranên gelê k'urd ên lîrîkî", "Stranên gelê k'urd ên mêranîyê", "Ç'îr'ok, meselok û efsaneyên k'urdî", "Zargotina k'urdî" (bi Celîl ê Celîl r'a t'evayî) û yên dinê yên bi nirx peyk'erên çanda k'urdî tên hejmartin, bi wat'eya herefreh a vê p'eyvê va.

Ji bilî wan berhemên, ên ku hatine weşandin, arşîveke gewre ya bêhemp'a û gelek destnivîsar mane, ên ku hîvîya dema xwe ne.

Cara dawîyê, dema ez li Sankt-Pêtêrbûrgê mêvanê professor bûm, ewî ez vexwendim odeya xwe ya k'ar, belgedangek qalîn – bi sedan r'ûp'elên destnivîsarên xwe û Celîl ê Celîl, li ber min danî û got: "Dema ez bibînim, ku ev k'arê me hatye weşandin, wê demê ezê bikaribim hêsa xatirê xwe ji vê cîhanê bixwazim..."

Ewî pê'r'a negîhand wî k'arî bibe sêrî, ew barê giran p'ara birayê wî biç'ûk û hemr'anaîyê wî – Celîl ê Celîl ma.

Ordîxan ê Celîl ji nava r'efê me çû, lê li dû xwe mîraseke dewlemend hişt, a ku dewlemendîya gelê me û k'urdzanîya cîhanê ya bi nirx û giranbiha ye.

Her mirovek, ê ku wê bi pirsên wêjeya k'urdî yan ên zargotina gelêrî ya gelê k'urd va mijûl bibe, yan wan bişopîne, ewê, bê fitya, li ser wê r'êyê r'astî berhemên zanîyarê navdar bê, û ew berhem dê r'êya wî ya bi r'ûmet a berbi lêger'în, wat'edarkirin û nirxdarkirina nimûneyên xezîneya r'ewanî û r'amanî ya gelê me r'onî bikin.

Gotinek a pêşîyên me heye, dibêjin: "Bilindahîya ç'îyan ji dûr vat ê xuyan!" Dehsal û sedsal dê bibihurin, û mezinahîya r'ola Ordîxan ê Celîl – wî zanyarê navdar, welatp'arêzê dilsoz û çalakvanê civakî di k'arê pêşveçûna çand û wêjeya net'ewî da dê çêtir bû xuyan.

Ewê hert'im di bîra gelê xwe û civaka zanyarî da bijî!

Lê em – birayên wî yên pênuşê û k'arhevalên wî – emê t'ime bîra wî bikin û bîranîna wî bi hezkirin di dil û r'ewana xwe da bip'arêzin...

Korda Mad (Ezîz ê Cewo Mamoyan)
Zimanzan, r'oernameger,
Endamê Yekîtiya r'oernamegerên R'ûsiyayê
û PEN-a navnet'ewî
Bajarê Moskovayê – nîsan a sala 2024-an.

Ev bîranîn sala 2024-an di Yêrêvanê da di hejmara 4 (190) a r'oernameya «Zuqpn»// "Zagros" da bi zimane ermernî hatye weşandin (r'ûpel: 6–7).